

Di derbarey dermanan de divê bala xwe bidin çi tiştêkî?

- » Koma Dermanxane, bersiva pirsên we didin di derbarey dermanan de û we re dibêjin ku çawan tên bikaranîn.
- » Heke hun dixwazin bê reçete (kaxezê doktor) derman bistînin, belkî karkerên dermanxane pêşniyar bikin ku hun herin cem doktor. Ev jî ji ber ewlehî ya we ye. Çimkî mimkin e ku hun nexweşiyek hebe ku pêdivî be ji aliyê doktor bê îlac kirin.
- » Piraniyên dermanên ku li Almaniya tên bikaranîn, bi rêya endastrî tên çêkirinê. Di dozên taybet de, belkî hinek dermanan ji aliyê karkerên dermanxane re bêt çêkirin.
- » Hemû dermanên ku bi rêya endastrî tên çêkirinê, percanek nav wan de heye ku ferman û rêya çawan bikaranînê nav de nivîsandine. Wekî mînak, heke dermanek tesîreka ne baş hebe, ev yek ne vê wateyê ku ev tesîr ser we tê nişandan. Heke ku pêdivî be, karkerên dermanxane dikarin fermanê nav percan ji bo we şirove bikin.
- » Hinek caran, karkerên dermanxane mimkin e ku dermanek nedin we.
- » Derman hemû helal ninin. Hinek dermanan gelatîn nav wan de heye ku ev jî ji tevneka beraz hatiye çêkirin. Heke hun her pirsek heye, karkerên dermanxane re pirs bikin.

- » Dermanên xwe li cîhên ewle xwedan bikin, daku zarokan nikarin wan re bikarbînin.
- » Ser paketên dermanan, dîrokek hatiye daxuyandin ku heta vê dîrokê derman dikare bê bikaranîn. Heke dîroka bikaranînê ret bûye, ji kerema xwe ev derman bavêjine nav zibilê. Hun nikarin derman bavêjin nav tiwalet an destşokan de. Herwisa dermanên şileme jî nikarin bavêjin nav destşok an tiwaletê, wekî mînak, şerbeta koxik.

ABDA 

Bundesvereinigung
Deutscher Apothekerverbände



Têkilî

ABDA – Bundesvereinigung Deutscher Apothekerverbände e.V.
Kommunikation und Öffentlichkeitsarbeit
Unter den Linden 19–23 | 10117 Berlin
www.abda.de

STAND: 12/15 · KURDISCH

AGAHÎ JI BO PENABERAN

Derman li Almaniya

Dermanê xwe kî derê distînî?

Penaberên ku mîna penaxwaz 15 heyvan li Almaniya akincî bûne, li gor qanûnê xwedan bîmeya / sîgorteya saxî ne. Ev dermanên xwe ji dermanxane distînin. Ev agahiyên jêrîn ji bo vê penaberane.

Penaberên ku kêmtir li 15 heyvan li Almaniya dimînin, ji aliyê Gerîndeyên berpirsyar, derman wan re tê dayîn.

Li Almaniya tenê di dermanxane de derman tê standin – cuda li hinek dozên derveyî – li dikanên din an li ofîsê doktor derman nayê standin.



Li Almaniya, 20.000 dermanxane hene. Her yek bi **îkona sora A** li derve tî xuyakirin. Her dermanxaneyek ji aliyê demanfiroşeke jin an mêr tê birêvebirin.

Dermanfiroşan **xizmetên giştiyên Şev- û servisa acil** didin pêşkêş kirin. Lê hemû dermanxaneyek bi aliyê domdar vekirî nine. Li ser rûpela **www.aponet.de** de dermanxaneyên ku ev xizmet pêşkêş dikin bi Şev an rojên yekşem, dikarin peyda bikin. Hun herwisa dikarin Sepanê „Apothekenfinder“ daxin.

Manayê „rezeptpflichtig“ (reçete pêdivî) û „apothekenpflichtig“ (dermanên bê reçete) çiyê?

Dermanên cur bi cur hene.

Dermanên ku reçete pêdiviye, tenê ji aliyê doktor tî dayîn. Reçete dikare rengên cur bi cur hebe, wekî mînak, pembe.

The image shows a standard German medical prescription form (Rezept). It includes fields for patient name, address, date of birth, and insurance information. There are also sections for the doctor's name, address, and signature. The form is titled 'Rp. (Bitte Leeräume durchstreichen)' and 'Vertragsarztstempel'. The bottom right corner indicates 'Abgabestadium in der Apotheke' and 'Unterschrift des Arztes Muster 16 (7/2008)'.

Gava ku hun reçete bînin dermanxane, ev dermanên ku doktor nivîsandîye, didin we. Dermanên ku reçete pêdiviye wekî mînak, dermanê pestoya jorê xwîne an nexweşiya şekerê û hemî corên antîbiyotîkan ji hember kotîbûnê.

Heke dermanên nivîsandî ji aliyê doktor di dermanxane de nebe, dermanxane dikare ev derman di çend saetan de peyda bike.

Dermanên ku reçete naxwazin (bê reçete ne), li dermanxane dikarin bistînin û ne hewceye ku herin cem doktor. Dermanên ku reçete naxwazin, wekî mînak ewene, dermanê zekem / sirê û gelek dermanên êşê.

Pereya dermanan çiqase?

Bihayê **dermanên ku reçete dixwazin** bi rêya qanûnî hatiye diyarkirin û li hemû dermanxaneyên Almanî de yek bihaye.

Bihayê dermanên ku reçete dixwazin di rewşên cuda de cudeye. Penaberan dermanên ku reçete hene, gelek caran bêpere distînin. Heke dermanek bêpere nebe, penaberan tenê nîvek di bihayê dermanê didin. Ev re dibêjin tevkariyên din („Zuzahlung“). Pereyê mayî ji aliyê ofîsa bîmeya saxlemî ya we an Nivîsgeha civakî tê dayîn.

Heke meaşê we gelek kême, hun dikarin qanûna ‘tevkariyên din’ berdin. Bi vî rengî hemî dermanên ku reçete pêdiviye, dikarin bêpere bistînin. Çawan dikarin dermanên xwe bêpere bistînin, divê li ofîsê bîme ya saxlemî ya xwe pirs bikin.

Dermanên bê reçete divê bihayê wan li dermanxane bidin. Ji bilî: heke doktor dermanekî bê reçete ji bo zarokê ku emirê wî jêr 12 sale pêşniyar kirye (an jî cihêlên jêr 18 salan ku pirsgirêkin pêşketinê hene), ofîsa bîmeya saxlemî pereyê vê dermanan jî dide.